

## Jiyana rojane ya ciwanan li ser Înternetê – heşt pêşniyazên ku ji daxilbûna te re dibin alîkar

Ev pêşniyaz li ser wê yekê radiwestin da weke dê û bav/salmezin tu baştirîn çawa dikarî bibî şîrkê tiştên ku zarokê te li ser Înternetê dike. Ji bo pêşniyaz û şîretan serdana bêtir malperan bike, weke mînak heger tu dixwazî di derbarê parastina ji vîrûsan û programên filîtrekirinê de zêdetir agahî wergerî. Heger tu li ser malpera [www.surfalugnt.se](http://www.surfalugnt.se) lêgerînekê bikî dikarî lînkên rêxistin û malperên ku li ser van pirsan radiwestin peyda bikî.

### 1. Her roj demeke kurt veqetîne û bi zarokê xwe re di derbarê Înternetê de biaxive.

Çawa ku tu li ser bûyerên li dibistan, antramana sporê û li bexçeyê leyîstinê de qewimîne pirsiyaran dikî her wekî vê di derbarê bûyerên li ser Înternetê de jî biaxive. Ji bo piraniya ciwanan ferqa di navbera hevdişîna bi rêya datayê û hevdişînek rastîn de zêde mezin nîn e.

### 2. Cesaret bike weke salmezinek tev bigere û sînoran deyne.

Ji bo zarokan tu car baş nîn e ku demeke dirêj datayê bi kar bînin an jî serdana malperên bi naverokên acizker bikin. Bi taybetî jî heger ev dibe astengiyek ji bo xwendina dibistanê an jî tendrûstiya wan a fîzîkî. Heger tu di wê baweriyê de yî ku zarok gelekî zêde û demên dirêj li ser Înternetê ye wê demê divê tu sînorên zelal yên di warê wextê de deynî. Heger zarok dikeve malperên ku bi ya te naveroka wan ne musaft e divê tu yekser wê/wî hişyar bikî.

### 3. Cesaret bike meraqdar be!

Bipirse da Înternet çawa kar dike. Zarok pisporê vê yekê ne û ji dil dixwazin jêhatîbûna xwe nîşan bidin. Bihêle ew malperên ku jê hez dikin û klîpên li ber dilê wan şîrîn in nîşan bidin.

### 4. Xwe hîn bike.

Carnan çend deqîqe veqetîne û li malperên cûda yên ciwanan surf bike ku tu bibînî da ew çawa nin. Bi vî awayî tu dikarî bibî xwedî fikrekî baştir da jiyana rojane ya li ser Înternetê ji bo zarokê te çawa ye. Wan nivîsên li ser ku kî xwediyê malperê ye bixwîne û her weha hîn bibe da heger pêwîst be mirov çawa gilî dike. Bi vî awayî tu dikarî baştir amade bî, heger tiştek biqewime.

### 5. Şert û qaîdeyên hevbeş deynin.

Bi zarokê re biaxive da ewê çiqas dem li ser Înternetê surf bike. Dibe ku di derbarê dirêjîya dema maqûl de fikrekê zarokê bi xwe hebe. Her weha biaxivin da çi cûre agahiyên şexsî rast

e ku mirov di derbarê xwe de li ser Înternetê belav bike. Danîna wêneyên xwe li ser Înternetê ne tiştêkî talûke ye, lê divê mirov ji serî ve baş bifikire da kê/kî dikarin xwe bigihînin vana.

#### **6. Heger tiştêkî biqewime ji gilîkirinê re bibe alîkar.**

Heger li ser Înternetê tiştêkî bê serê zarokê, wê/wî şermezar neke. Guhdariya zarokê bike û bihêle ku zarok nîşanî te bide da çi qewimî ye, da ku tu jî karibî ji bûyerê agahdar bibî. Her dem gilî bike! Di piraniya malperan de fonksiyonekê gilîkirinê heye. Evana gelek caran di bin sernivîsên "anmâl" yan jî "abuse" de li jêra rûpelan hene. Heger kiryar(faîl) li derdora zarok be, weke mînak diçe heman dibistanê, baştir e ku tu dibistanê jî di derbarê bûyerê de agahdar bikî. Tahda û eziyetkirina li ser Înternetê hema hema her tim bi rewşa li dibistan yan jî sinifê ve girêdayî ye.

#### **7. Nimûneyek baş be.**

Hewl bide tiştên di derbarê Înternetê de ku tu dibêjî û dikî hevûdû bigirin. Heger tu dixwazî zarok li gorî daxwazên te li ser Înternetê hereket bike wê demê baştir e ku tu jî wan şert û qaîdeyên we danîn e bicîh bînî.

#### **8. Li wir be.**

Ji bo "li wir bî" ne pêwîst e tu têkevî hemû wan malperan ku zarokê te serdana wan dike. Carnan bes e ku tu zanibî da ew li ser çi diaxivin. Wê demê hêsantir dibe tu li wir bî, heger pêdiviya zarok çê bibe ku li ser serpêhatiyên xwe yên baş û nebaş biaxive. Tu dikarî li wir bî dema tiştêkî ne li rê biqewime û ew neçarê alîkariya te be. Yan jî dikarî weke salmezinek li ser Înternetê bî.